
Nivîsar û şikil: Willem de Vink

# Îsa Mesîh



Nivîsar û şikil: Willem de Vink

# Îsa Mesîh



Nivîsar û şikil: Willem de Vink
Xudanê neşirkirinê: © 1993 Stichting Wereldtaal, Houten, The Netherlands Published in Dutch as "Jezus Messias"

Cabdarê t'ercimekirina welatder: Wycliffe Netherlands, Postbus 150, 3970 Driebergen, The Netherlands  +31(343)517444, www.wycliffe.nl, e-mail : jmpbk.app@gmail.com

Digital copyright under the terms of the creative commons BY-SA license
All rights of translation, reproduction and adaptation reserved for all countries.

T'ercimekirina zaravê Kurmancîya Kafkazê: © 2016 K'omela K'urdêd Xwedênas t'evî SIL
H'emû heq xweykirî ne bin Creative Common BY-SA licence
Komela.bawermenda@gmail.com




Çima ev meriv li ber ç'êm t'op bûne?



Ji gunekirinê veger'in, çimkî P'adşatîya E'zmana nêzîk bûye.


E'mirê t'eze destpêkin!
Va ye, bivirê dîwana Xwedê li ser r'awêd dara ye.
Her dara ku berê qenc nayne, wê bê bir'înê û avîtinê nava êgir.
Heger usa ye, em h'emûyê bêne bir'înê. Îdî k'î dikare bê gune bijî?
Belê r'ast e. T'u kes nikare ji dîwana Xwedê bir'eve. Lê pey minr'a wê Yekî ji min qewattir bê. Ew dikare we ji guna aza ke û binyat'a weye xirab biguhêze.
Heger hûn bi r'astî dixwazin ku e'mirê we bê guhastinê, gunêd xwe bidine r'ûyê xwe û nav avêda werine nixumandinê.
Îdî hûn ji gunêd xwe paqij bûne, wekî e'mirekî nû destpêkin.


Cime'tê Yûh'ennar'a digotin: «nixumdar».
Ez ne yekî mezin im. Lê ez r'îya Xudan hazir dikim, Yê ku wê bê û r'astîyê nîşanî me bike ku Xwedê k'î ye. Ewê we pê R'uh'ê Xwedê binixumîne, wekî t'emamîya e'mirê we bê guhastinê.
û paşê...
Ez h'ewce me ku bi destê Te bême nixumandinê.
Niha bihêle, çimkî li me dik'eve ku xwestina Xwedê bînin sêrî.
Xwedêyo, de bira P'adşatîya Te bê, e'mirê Te be.
Û dengek ji e'zmên hat û got:
Ev e Kur'ê Minî delal, ku Ez ji Wî r'azî me.


Wê hingê Yûh'ennayê nixumdar cime'ta Îsraêlê bona hatina Mesîh hazir dikir. Wî çaxî welatê wan bin destê Împêratorîya R'omayêda bû.
Îsraêl
Kefernahûm
Nisret
Qana
Celîle
Orşelîm (Quds)
Ç'emê Ûrdunê
Cihûstan
Cime'ta Îsraêlê xwe hêsîr û bê qewat didît. Ew hîvîya hatina Mesîhê sozdayî bû, çawa k'itêbêd wane pîrozda nivîsar bûn. Xwedê wê Ew Xilazkir bişanda, awa gotî Mesîh, ku r'astîya Xwedê pê Wî ser k'eta.
Li ber ç'emê Ûrdunê Yûh'ennayê nixumdar bona Îsa şe'detî dida.
Va ye, Berxê Xwedê, Yê ku gunêd dinyayê hildide.
Pey nixumandinêr'a R'uh'ê Xwedê Îsa bire ber'îyê.
Îsa 40 r'ojî û 40 şevî r'ojî girt. Ewî t'u tişt ne dixwar ne jî vedixwar, lê dua dikir, wekî Ew bona xizmetk'arîya Xwe hazir be.
Wekî Îsa ser bik'eta, lazim bû ku Ewî xwestina Xwedê bigihanda merivayê. Çimkî meremê Xwedê ew e, ku mêriv ji undabûnê xilaz ke.
Îsa li mîrêcin, awa gotî li yê xirab yanî şeytan hilat, yê ku serwêrê te'rîstanîyê ye û pê mirin û undakirinê serwêrtîya dinê dike.
Belê Bavo, çi ku Tu dixwazî Ezê bikim.


Lê mîrêcin dixwest ku bi fikirêd şaş Îsa ji şandîtîya Xwedê bixalifanda.
*Mîrêcin got: «Heger Tu Kur'ê Xwedê yî, de bêje van kevira ku bibine nan!»*
Nivîsar e: «Însan t'enê bi nên najî, lê pê her xebera ku ji devê Xwedê derdik'eve».
*«Heger Tu bi r'astî Kur'ê Xwedê yî, de îzbat ke! Xwe jorda bavêje xwarê. Gelo ne nivîsar ê, ku milyak'et wê bên Te bigirin?»*
Ev jî nivîsar e: «Xudan Xwedêyê xwe necêr'ibîne».
*«Heger Tu ber min ta bî û serê Xwe li ber min daynî, ezê h'emû h'ukumê dinê bidime Te!»*
Dûrî Min her'e, cino! Nivîsar e: «Serê xwe li ber Xwedê dayne û t'enê Wî bih'ebîne».
Wî çaxî mîrêcin Ew hişt çû û milyak'et hatin Îsar'a berdestî kirin.
Îsa bi R'uh'ê Pîroz t'ijî veger'îya Celîlê, k'îderê Ew mezin bibû. Ew dik'eve bakura Îsraêlê û cime't li wir ze'f bû. Çend meriv t'evî Wî çûn, dixwestin pê bih'esîyana, belkî Ew e ew Mesîh, bona k'îjanî p'êxemberêd wan nivîsîne.


Bajarê Qanaya nava ç'îyayêd Celîlêda de'wat hebû.
Îsa jî li wê derê bû t'evî dîya Xwe û çend hevalêd Xweva.


Lê nişkêva, we'dê de'watê...
Şerav xilaz bû! Em çi bikin?
Çi ku Îsa wer'a bêje bikin.
Van k'ûpa t'ijî av kin. Niha hinekî dagirin, bibin bidine serde'watî.
?
Ev e'cêb e. Ew çi şeravêke xweş e!
Hela te'm ke! Te şerava xweş hiştîye xilazîyê.
Ez bawer nakim! Ez t'u car li de'wateke aha nebûme. Av bûye şerav - şerava here baş!
Ew Îsayê Nisretê kirîye!
Ew k'î ye?


Kefernahûm gundekî me'sîgira ber devê gola Celîlê bû. Îsa li wir destpêkir bona P'adşatîya Xwedê dannasîn dikir.
Hema li wir jî Îsa şagirtêd Xweye e'wlin bijartin.
Petrûs, qeyikê bibe cîyê k'ûr û t'or'êd xwe bavêjine nêç'îrê.
Mamosta, me t'emamîya şevê kir-nekir tiştek negirt.
Lê bona xatirê Te ezê bavêjimê.
Ez bawer nakim!


Aqûb! Yûh'enna! Werin! Me t'u cara usa gelek negirtine.
Xweyî, dûrî min her'e. Ez yekî gunek'ar im.
Netirse, Petrûs!
Pey Min werin, Ezê we bikime nêç'îrvanêd meriva.
Pey Min werin!


Îsa t'evî şagirtêd Xwe t'emamîya Celîlê diger'îya û h'emûyar'a bona P'adşatîya Xwedê digot. Wî gelek nexweş silamet dikirin, r'uh'êd h'eram jî derdixistin. Meriv zendegirtî diman û pey Wî diçûn. Ji qezayêd dûr dihatin, ji Orşelîmê jî, ku hingê p'ayt'extê Îsraêlê bû. H'emûya gotinêd Wî dibihîstin.
Xwezî li r'uh'feqîra, çimkî P'adşatîya E'zmana ya wan e.
Xwezî li wanêd, ku bir'çîyê r'astîqedandinê ne, çimkî ewê t'êr bin.
Xwezî li we, ku hûn niha digirîn, çimkî hûnê bik'enin.
Xwezî li we, gava hûn bona Min ber ç'e'vê merîya r'eş bin. Wê r'ojê eşq bin û ji şabûna bira nigê we e'rd negire, çimkî heqê we li e'zmên gelek e.


Û çawa hûn dixwazin meriv bona we bikin, hûn jî usa wanr'a bikin.
Dijminêd xwe h'iz bikin û bona wan dua bikin.
Awa çaxê tu xêra dikî, pêşîya xwe bor'îyê nexe.
K'î bi temê xirab jinekê binihêr'e, ewî dilê xweda îdî t'evî wê zinêk'arî kir.
Ç'ira bedenê ç'e'v e. Heger ç'e'vê te p'ak e, t'emamîya bedena teyê r'onayî be. Lê heger ç'e'vê te xirab e, t'emamîya bedena teyê te'rî be.
T'u kes nikare du axar'a xulamtîyê bike. Hûn nikarin hin Xwedêr'a, hin jî hebûkêr'a xulamtîyê bikin.
Bona r'oja sibê xema nekin. Lê berê pêşin li P'adşatîya Xwedê biger'in û bikin, ku r'astîya Wî biqedînin û ew h'emûyê wer'a bêne dayînê.
Awa k'î ku gotinêd Min dibihê û wan diqedîne, ew mîna merivekî serwaxt e, ku mala xwe ser kevir çêdike. Lê k'î ku van gotinêd Min naqedîne, ew mîna merivekî bêfe'm e, ku mala xwe ser qûmê çêdike.


R'ojekê, maleke Kefernahûmêda, gava gelek meriv li dora Îsa t'op bibûn...
Em wirar'a nikarin derbaz bin.
R'ast e, gere em t'enê ji banva peya bin.
Çi diqewime li wir?
Wan bihêlin û binihêr'in bawerîya wan çiqas mezin e.
Lawo, gunêd te hatine baxşandinê.
Te bihîst? Ewî çi got?
Ew Xwedê bêhurmet dike!
Pêştirî Xwedê kes nikare guna bibaxşîne.
K'îjan r'ih'et e, şilûşe'tr'a bêjin: ‹Gunêd te hatine baxşandinê›, yan ‹R'abe û biger'e›?
Bizanibin, h'ukumê Mesîh heye ku guna bibaxşîne. Lê Ez ter'a dibêjim jî: «R'abe, nivîna xwe hilde û her'e mala xwe!»




Lê her kes bi kirêd Îsa r'azî nîbû. Serwêr û qanûnzana dîna xwe dane Îsa, gelo Ew qanûna r'oja şemîyê xwey dike yan na. Çimkî vê r'ojêda îzina t'u kesî t'une bû şixulek bikira.

















Îsa şagirtêd Xweva bi qeyikê diçe ser gola Celîlê.
Mamosta, mamosta! Em unda dibin!
Çima hûn ditirsin, bawerîya we k'anê ye?



Bisekine, ker' be!
Ewana qeyika xwe ber devê golê girêdan. Lê nava ç'îyada...
Wey, wey!


Nava ç'îyada merivek dijît ku r'uh'ê h'eramva girêdayî bû.
Ew nêzîk dibe!
Aax! Aax!
Wey, wey! Îsa!
Hey r'uh'ê h'eram! Ji vî merivî derk'eve!
Tu çi ji min dixwazî, Îsayê, Kur'ê Xwedêyê Herî Jorin?
Navê te çi ye?
K'omeşker, çimkî em gelek in.
Bihêle, em bik'evine nava beraza.
Her'in!


?
Ez qenc bûm. Ez aza bûm!
Her'e ji vir!
Ez dikarim t'evî Te bêm?
Na, li vir bimîne û merivar'a bêje ku Xwedê bona te çi kir.



Ez wer'a dibêjim: Kur' Xwexa nikare tiştekî bike. Ew dibîne çawa Bav dike, Ew jî usa dike. Ne ku Ez li xwestina Xwe diger'im, lê li xwestina Bavê Xwe. Ew e ku Ez şandime.
Îsa gelek cara diçû cîyêd xewle, wekî dua bike.
Pey şeveke duakirinêr'a Îsa her 12 şagirtêd Xwe bijartin. Wî ew cot-cot şandin, h'ukum da wan, ku cina derxin û nexweşa qenc kin.
Ew bûn her du bira Petrûs û Endrawis...
Aqûbê Zebedî û birê wî Yûh'enna...
Fîlîpo û Bertolomeyo...



T'ûma û Metta (yê ku pêşîyê xercgirekî bona r'omayîya bû)...
Aqûbê Halfawo û Tedayo...
Şimh'ûnê welatp'arist û Cihûdayê Îsxeryotî.
Her'in! Ewê ku we qebûl dike, Min qebûl dike û ewê ku Min qebûl dike, Yê ku Ez şandime qebûl dike.
Ew 12 şagirt ji şandîtîya xwe veger'îyan - agir dila k'etî. Peyr'a Îsa xwest, ku t'evî wan her'e cîkî xewle, lê cime't pey wan diçû.
Nandirûn gelek e, lê p'ale hindik in. Awa hîvî ji Xweyê dirûnê bikin, wekî p'ala nandirûna Xwer'a bişîne.


Îsa dîsa dannasîn dikir û nexweş qenc dikirin. Êvar bû...
Fîlîpo, emê nên ji k'u derê bik'ir'in, wekî ev merivana bixwin?
Maşê h'eyşt meha t'êra wan nake!
Lê li vir xortek heye, ku t'enê pênc nanêd wîye ceh û du me'sîyêd wî hene. Lê bona haqas meriva ev çi ye?
Cime'tê pêncî-pêncî bidine r'ûniştandinê.
Îsa şikirî da Xwedê...
Paşê nan û me'sî kerkirin û da şagirta, ku belayî e'laletê kin.


Îsa nan zêde kir û h'ezara meriv t'êr bûn.
T'exmîna min eva Ew Mesîhê sozdayî ye, ku gerekê bihata.
Em gerekê Wî bikine p'adşa.
Hela binihêr'e, 12 sele jî ji hûrikêd bermayî zêde man!
Îdî dereng e. Cime't bira her'e malêd xwe. Hûn jî derbazî wî berî golê bin, Ezê her'im serê ç'îyê, dua bikim.



Peyr'a...
Ser xwe bin! Ez im, netirsin!
Wey, ev xeyal e!
Xudan, heger Tu yî, e'mir ke, ku ez ser avêr'a bême cem Te.
Were, Petrûs!
Xudan, min xilaz ke!
Kêmbawero! Çima tu dudilî bûyî?


Meriv hebûn dixwestin ku Îsa bikirana p'adşa. Hîvîya wan bû, wekî bin h'ukumetîya Îsada ew ji bindestîya r'omîya xilaz bibûna. Lê dijminêd Îsa jî zêde dibûn. Ewana dikir, ku cime'tê miqabilî Wî r'akin û jê xilaz bin.
Dersdar, Tu k'engê hatî vê derê?
Hûn li Min diger'in, çimkî Min nan da we?
Bona xwarina p'ûç' nexebitin, lê bona wê xwarinê bixebitin, ya ku jîyîna h'eta-h'etayê dide we.
Ez ew nan im, ku jîyîna h'eta-h'etayê dide. Ev nan bedena Min e, ku bona jîyîna dinyayê tê dayînê.
Eva çawa dikare bedena Xwe bide me, ku em bixwin?
Ew çi dibêje?!
Bela bin, merivno!
Ew derewîn e.
Dibe ku hûn jî dixwazin her'in?
Emê her'ine cem k'ê? Gotinêd jîyîna h'eta-h'etayê cem Te ne.


Dijminêd Îsa hê zêde dibûn. Ewî Celîle hişt, çû xizmeta Xwe qezayêd Îsraêlêye mayînda dûmayî kir. Gelek cime't, jin û mêr, t'evî Wî bûn.
Celîle
Orşelîm (Quds)
Îsraêl
Paşê Îsa çû Orşelîmê.
Ser r'ê...
Bi t'exmîna meriva Ez k'î me?
Ew difikirin Tu p'êxemberek î.
Lê hûn çi dibêjin?
Bi t'exmîna we Ez k'î me?
Tu Mesîhê sozdayî yî, Xilazkirê ji Xwedêda şandî.
Evê yekê kesîr'a nebêjin. Mesîh gerekê her'e Orşelîmê, cefê bik'işîne û bê kuştinê. Lê r'oja sisîya wê ji mirinê r'abe.


Hingê gelek cara diqewimî, ku meriv li gora qanûna r'omîya dihatine xaçkirinê. Û ew cî nêzîkî bajarê Orşelîmê bû.
Heger yek dixwaze bibe şagirtê Min, gere ew ji cefa netirse, xaçê xwe hilde û li pey Min bê.
K'î dixwaze e'mirê xwe xilaz ke, ewê unda ke. Lê k'î ku e'mirê xwe bona Min unda ke, ewê xilaz ke.
Hûn gerekê bizanibin, t'enê Xwedêk heye.
Lema gere hûn Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikin bi t'emamîya canîya xwe. Usa jî merivne mayîn weke xwe h'iz bikin.


Wî çaxî Îsraêlêda bona gur'îya gund hebûn. Ew nexweşîya ç'erme gelekî giran e. Îzina gur'îya t'unebû, bik'etana nava merivêd silamet.
Gava gur'î diçûne cîkî, pêşda dikirin gazî û bona hatina xwe digotin.
Haş ji xwe hebin! Em gur'î ne!
Îsayê mamosta! Li me were r'e'mê!


Her'in xwe nîşanî k'ahîna kin.
Em her'in cem k'ahîna, wekî me bibînin?
Emê hingê qenc bin?
?
!
Bibînin, ez paqij bûme!
Em paqij bûne!
Erê!
Şikir, şikir Xwedêr'a! Ze'f r'azî me!
Ne her dehe jî paqij bûn? Lê k'anê ne her nehêd din? Ew nehatin, şikirî bidana Xwedê?
R'abe her'e. Bawerîya te ne t'enê tu qenc kirî, lê xilaz kirî jî.



Serwêrêd cihûya Orşelîmêda xulamêd xwe şandin, wekî ce'sûsîya Îsa bikin. Ew gelekî miqabilî kirêd Wî bûn.
Ew t'evî merivêd usa xeber dide, ku ber ç'e'vê h'emûya r'eş in, mîna qav yan xercgira, k'îjan bona r'omîya dixebitîn.
Bona vê yekê Mesîh hat, wekî li undabûyîya biger'e û wan xilaz ke.
Îsa r'oja şemîyê jî nexweş qenc dikirin.
Tu qenc bûyî!
Ewî gelek guh dida ser zar'a.
Bira ew zar'ok bêne cem Min, pêşîya wan negirin, çimkî P'adşatîya Xwedê p'ara yêd aha ye.


Gazî Îsa li Bêtanyayê dikin, ew gundekî ji Orşelîmê ne dûr e. Lazar nexweş bû. Ew t'evî xûşkêd xwe, Meryem û Mert'ayê, hevalêd Îsaye nêzîk bûn. Lê çaxê Îsa hate Bêtanyayê, îdî çar r'oj bû ku Lazar definkirî bû.
Mamosta!
Xweyî, heger Tu li vir bûyayî, birê minê nemira.
Birê te wê ji mirinê r'abe, Mert'a.
Ez zanim. R'oja Axretê, R'oja R'abûnê ewê r'abe.
Mert'a bibihê: Ez im r'abûn û jîyîn! Ewê ku Min bawer bike, heger bimire jî wê dîsa bijî. Tu vê yekê bawer dikî Mert'a?
Belê, ez bawer dikim ku Tu Mesîhê sozdayî yî - Tu Kur'ê Xwedê yî, Yê ku wê bihata dinyayê.
We ew li k'u defin kirîye?
Mamosta, were û bibîne.




Dîna xwe bidinê, çiqas jê h'iz dikir!
De Evî nikaribû usa bikira, ku Lazar nemira?
Hingê Îsraêlêda mirî bi k'efen dip'êç'an û dikirine t'irbêd qeya.
Vî kevirî wêda kin.
Mamosta, îdî niha bîn k'etîyê. Îro îdî çar r'ojêd wî ne ku mirîye.
Min ter'a negot: «Bawer bike, tê r'ûmeta Xwedê bibînî»?
Bavo, Min bona xatirê vê cime'ta sekinî got, wekî bawer bikin ku Te Ez şandime.
Lazar, derk'eve!
Wî vekin û bihêlin bira her'e.



Hînkirina Îsa serwêrêd Orşelîmê xweş nedihat. Ewana bona Îsa û peyçûyêd Wî gelekî difikirîn.
Eva meriva gelek k'eremeta dike.
Heger em aha bihêlin, r'omayî wê bên.
Wê p'aristgeha me wêran kin, miletê me jî qir' kin!
R'ind bifikirin! Mer'a hê dest dide, merivek bimire bona cime'tê, ne ku t'emamîya milet unda be.
Bona vê yekê ew Îsa gere bimire!
Hingê serwêrêd cihûya mecalekê ger'îyan, wekî Îsa t'esmîlî r'omîya bikin, çimkî cezayê bona kuştinê t'enê li wan dik'et.


Gava Îsa Bêtanyayêda bû ...
Meryem!
Ev r'ûn gelekî biha ye.
Me dikaribû ev r'ûn bifirota û ew p'ere belayî feqîra kira.
Tu xatirê wê nek'eve, Cihûda. Ewê pêşda bedena Min definkirinêr'a r'ûn kir.


Hingê Cejina Derbazbûnê nêzîk bû, ji ber vê yekê gelek meriv dihatine Orşelîmê.


Serwêrêd Orşelîmê şêwira xwe kirin, ku Îsa bigirin. Îsa ew yek zanibû, lê dîsa çû wî bajarî.



E'laletê bi şabûn Ew qebûl kir.
Hosanna!
Hosanna!
Bimbarek e, p'adşê Îsraêlê!
Bimbarek e, Ewê ku bi navê Xwedê tê.
Xwezî te hema îro bizanibûya e'dilayîya te çiva girêdayî ye! Lê niha tu naxwazî.
Eva yeka ji qewata me der e.
T'emamîya dinyayê pey Wî diçe.


P'aristgeha Orşelîmê cîyê h'ebandina here mezin bû.
Cejina Derbazbûnêda gelek berx serjêdikirin.
Bona ku meriv t'evî Xwedê e'dil bin, P'aristgehêda berx dihatin qurbankirinê.
Lê gelo xûna berxê dikare mêriv ji guneha aza ke?
H'ewşa P'aristgehêda meriv k'ir'în û firotanêva mijûl dibûn.
Îsa jî hate wir ...



Mala Xwedê mala dua ye, lê we ew kirîye şkefta qaçaxa.
Ew yek bona me qezîke mezin e, cime't her xebera Wî qebûl dike.
Gere em zû ji Wî xilaz bin.


Em gerekê Wî bi mixenetîyê bigirin. Paşê em Wî bidine kuştinê.
Bira ev yeka cejinêda nîbe, wekî cime't r'anebe ser niga.
Hûnê çi bidine min, wekî ez Wî bidime destê we?
Ew yekî ji şagirtêd Wî ye.
Ez Cihûda me. Ez dikarim Îsa bidime destê we.
Emê qîmetê xulamekî bidine te: sî zîvî.


H'eta Cejina Derbazbûnê Îsa P'aristgehêda merivar'a xeber dida. Serwêr jî hê serh'işk dibûn.
Wê şevê Îsa û her 12 şagirtêd Xweva malekêda bona Şîva Cejina Derbazbûnê civîyan.
*Eva wextekî baş e!*


Ez gelekî h'izreta vê Şîvê bûm, wekî t'evî we berî cefê Xwe bixwim.
Giregirêd dinê dixwazin, ku meriv berdestîya wan bikin, lê hûn usa nebin.
K'î nava weda dixwaze bibe yê mezin, gerekê bibe mîna berdestî.
Ez nava weda mîna berdestîkî me.


Xweyê min, Tê mîna xulamekî nigêd min bişoyî? Na, t'u car!
Heger Ez nigêd te neşom, p'ara te wê t'evî Min t'unebe.
Heger usa ye, dest û serê min jî bişo.
Ewê ku hatîye şûştinê, t'emam pêva paqij e, pêştirî niga.
Hûn Min Dersdar û Xudan h'esab dikin, hûn r'ast dikin. Awa çawa Min nigêd we şûştin, gerekê hûn jî nigêd hevdu bişon, awa gotî hevr'a berdestîyê bikin.
Yekî ji we wê Min bide dest.
T'u car!
Dibe ku ez im?
Cihûda, de tê çi bikî, zû bike.



Vê yekê bona bîranîna Min bikin.
Evî nanî hildin bixwin. Eva bedena Min e.
Evê k'asê jî hildin, ya ku xûna Minva girêdayî ye. Ewê bona we bê r'êtinê. Bi vî awayî Xwedê peymana nû t'evî we girêdide.
Ez t'emîke nû didime we: Çawa ku Min hûn h'iz kirin, hûn jî usa hevdu h'iz bikin.
Heger hûn hevdu h'iz bikin, h'emû wê bizanibin ku hûn şagirtêd Min in.
Mamosta, ezê t'imê pey Te bêm. Ezê e'mirê xwe jî bona Te bidim.
Petrûs, Ez r'ast bê xêlif ter'a dibêjim, hê dîk bang nedayî tê sê cara Min înk'ar kî.


Êvarê Îsa t'ev 11 şagirtêd Xwe ji bajêr derk'etin, lê Cihûda ne t'evî wan bû ...
Ezê ji we her'im, lê Bav Xwedê wê R'uh'ê Pîroz wer'a bişîne. Ewê piştovanîya we bike û her gav t'evî we be.
Hûn r'îya wî cîyê ku Ez diçimê zanin.
Ez im r'ê, r'astî û jîyîn. T'enê pê Min yek dikare bê cem Bavê.
Vira r'ûnên, h'eta ku Ez dua bikim.
Bavo! Her mecal ji destê Te tê, evê k'asa ji Min dûr xe.
Lê bira xwestina Min nîbe, lê ya Te be.


Hûn çawa dikarin vî h'alîda r'azên? R'abin! Yê ku Min dide dest, nêzîk e.
Ez k'îjanî ku r'amûsim, Ew e. Wî bigirin!
Silav li Te, dersdar!
Cihûda! Tu bi r'amûsanê Mesîh didî destê wan?
Xweyê min, em bi şûr li wan xin?
Na, Petrûs!
Îsa îzin da ku Wî bigirin. Şagirtêd Wî r'evîn.



Îsa anîne ber serekk'ahîn. Ew yê herî mezin nava serwêrêd cihûya bû. Petrûs û Yûh'enna ji dûrva li pey wan diçûn.
Petrûs dik'eve h'ewşê.
Gelo, tu ne t'evî Îsa bûyî?
Na, hûn çi dibêjin? Ez nizanim Ew k'î ye!
K'ifş e, tu jî yekî ji wan î!
Wele, ez Wî nas nakim!
Belê, tu t'evî Wî bûyî, çimkî ji Celîlê yî.
Filan kes! Ez nizanim tu çi dibêjî.


Qîîî qilîî qîîîîîî
Esker xeyba Îsa dikin ...
De p'êxembertîyê bike, k'a k'î bû ku Te xist?
Gava sibeh zelal bû, Îsa k'aşî civîna giregira kirin.
Tu Kur'ê Xwedê yî?
Hûn xwexa dibêjin ku Ez Ew im.
We ev bihîstîye? Ew Xwedê bêhurmet dike! Ew yê kuştinê ye! Bira r'omîya ceza bidinê.



Îsa dane destê welîyê r'omîya, navê wî Pîlato. Cime'tê jî cûr'e cûr'e şikîyat li Wî dikirin.
Tu nabihêyî çiqas şikîyatê Te dikin? Tu tiştekî nabêjî?
Te çi kirîye?
Ez hatime, ku bona r'astîyê şe'detîyê bidim.
R'astî çi ye?
Ez t'u neheqîyê Vîda nabînim. Lê îdî Cejina Derbazbûnê ye. Hûn k'îjanî dixwazin ez bona we ber'dim? Barabas yan p'adşê cihûya?



Barabas!
Barabas aza ke!
Lê hûn çi dibêjin, ez îdî Ewî Îsayî çawa bikim?
Wî xaç ke!
Ew dibêje «Ez Mesîh P'adşa me».
Heger tu vî merivî ber'dî, tu ne dostê Qeyser î.
Tu dikarî her'î. Dewsa Wî tu aza kirin.
Barabas aza bû. Ew bona mêrkuştinê nava serhildanêda sûcdar bû.
... 37! 38! 39!
Ez ji xûna Wî bêsûc im.
Xweş be, p'adşê cihûya!


Va ye, Ew meriva!
Xaç ke!
Wî xaç ke!
Belê, Ewî xaç ke!
Pîlato qirara xaçkirinê qol kir. Xaçkirin hingê qirara kuştinêye here saw bû.
Gerekê Îsa Xwexa darê xaçbûna Xwe k'ûçêd Orşelîmê'ra derbaz kira bibira.
Cîyê kuştinê ji bajêr der bû. Navê wî cîyî «Golgota» bû, awa gotî «Cîyê Qafa».
Eskera Îsa li wê derê xaç kir.



Hingê Cihûda bona kirê xwe p'oşman bû.
Min gune kir.
Ez bûme sebebê xûna bêsûc.
Çî mer'a ye? Ew îşê te ye.
Du qaçax jî t'evî Îsa hatine xaçkirinê.
Bavo, bibaxşîne van, çimkî cime't nizane çi dike.


Û fêza serê Wî bi sê zimana nivîsar bû:
EVA P'ADŞAYÊ CIHÛYA YE.
IESVS NAZARENVS REX IVDAEORVM
Îsa dermanê ji ber êşêva venexwar.
Eskera ser k'incêd Wî p'eşk avîtin.
Xelq xilaz kir, lê Xwe nikare xilaz ke!
Heger Tu Kur'ê Xwedê yî, ji xaç were xwarê!
De me xilaz ke, Xwe jî pêr'a.
Tu ji Xwedê natirsî? Me heqê e'melêd xwe stand, lê ev meriv t'u xirabî nekirîye.
Îsa, min bîr bînî, gava P'adşatîya Xweva bêyî.
Ez r'ast ter'a dibêjim, îro tê t'evî Min buhiştêda bî.


Nîvro bû, gava r'ûyê r'oyê hate girtinê û t'emamîya e'rdê bû te'rî.
Dîya Îsa, Meryem, û Yûh'enna, şagirtê Wî, ber xaç sekinî bûn.
Niha hûn bûne dê û kur'.
Xwedêyê Min, Xwedêyê Min, Te çima Ez hiştim?
Ez t'î me.
Bavo, r'uh'ê Xwe didime destê Te.
Her tişt hate sêrî!



Piştî nîvro sih'eta sisîya Îsa r'uh'ê Xwe da. Eskerekî r'im nek'sa Wîr'a kir û av û xûnê avît.
Çawa Îşaya p'êxember nivîsî: «Ew mîna pêz hate birinê li ber qusêsê xwe».
Ew bona gunê me hate birîndarkirinê û pê birînê Wî em xilaz bûn. Lê Ew niha mirîye.
Lê gelo Ewa ew Xilazk'ar bû, ku gerekê bihata?
Were em îzinê bixwazin, wekî Wî defin kin.
Ûsivê ji Arîmetyayê û Nîkodêmo cinyazê Îsa hildan, biharet lê dan û Ew qedekê k'itanîda k'efen kirin. Paşê Ew kirine t'irbeke nû û bi kevirekî mezin ew hate dadanê.



Pey r'oja şemîyêr'a, ya ku li gora Qanûnê r'oja r'ih'etbûnê bû, çend k'ulfet çûne ser t'irbê ...
Kevir ji ber t'irbê holkirî ye.
Hûn çima li Yê sax nava mirîyada diger'in? Ew ji mirinê r'abûye. Her'in û bêjine şagirtêd Wî!
Gava Petrûs û Yûh'enna ev yek bihîstin, derk'etin berbi t'irbê çûn.
Çi qewimîye?
T'irb vala ye!



Ber t'irbê ...
E'vdê, tu çima digirîyî? Tu li k'ê diger'î?
Ez xulam, gelo te Ew danîye k'u derê?
Meryem!
Mamosta!
Her'e û birayêd Mînr'a bêje: Ezê veger'im cem Bavê Xwe û Bavê we, cem Xwedayê Xwe û Xwedayê we.


Vê r'ojê du şagirtêd Îsa berxwek'etî çûn, ser r'ê bona kuştina Îsa xeber didan. Nişkêva merivekî nenas nêzîkî wan bû.
Hûn çima gotinêd p'êxembera bawer nakin? Ne gerekê Mesîh cefa bik'işanda û bik'eta r'ûmeta Xwe? Her tişt K'itêba Pîrozda nivîsar e!
Nişkêva, we'dê nan xwarinê, Ew ber ç'e'vê wan betavebû.
Ew Îsa bû!
Hema wê gavê ew r'abûn veger'îyan, ku şagirtêd mayîn bibînin.
Me Xudan dît!!!
Meryemê û Petrûs jî Ew dîtibûn!!
Nişkêva ...
R'oja we xêr!
Hûn çima bawer nakin, ku Ez Xwexa me? Li dest û p'îyêd Min binihêr'in!
Xudanê min û Xwedêyê min!


Çil r'ojî Îsa Xwe nîşanî şagirtêd Xwe dikir, usa jî 500 merivêd mayînr'a xuya bû. R'ojekê çend şagirta ser Gola Celîlê me'sî digirtin ...
Lawikno! Gelo tiştekî weyî xwarinê heye?
Na, me tiştek negirtîye.
T'or'ê bavêjine alîyê qeyikêyî r'astê, hûnê bigirin.
Çi nêç'îreke baş e.
Ew Xudan e!
Mamosta!
Werin, te'ştê bixwin.


Şimh'ûn, tu bi r'astî Min h'iz dikî?
Îsa ev pirs sê cara da Petrûs ...
Belê Xudan, Tu zanî ku ez Te h'iz dikim.
De pezêd Min biç'êrîne!
Pey Min were!
H'emû h'ukumê e'rd û e'zmên Minr'a hate dayînê. Niha her'in h'emû mileta hîn kin, wekî pey Min bên. Wana bi navê Bav, Kur' û R'uh'ê Pîroz binixumînin û her tiştê ku Min wer'a got wanar'a bêjin.
Û têkine bîra xwe: Ez îroda t'imê h'eta axirîya dinyayê t'evî we me.
Pey van xeberar'a Îsa dinê hişt û hilk'işîya e'zmên. Lê Ewî usa jî got ku wê dîsa veger'e, ku dîwana meriva bike.


Şagirt Orşelîmêda diman û dua dikirin. R'oja Pêntêkostê R'uh'ê Xwedê, awa gotî R'uh'ê Pîroz, peyayî ser wan bû. Ew R'uh'ê ku t'evî Îsa bû, hat nava wanda ma. Pê Wî e'mirê nû destpêbû, usa ku ew bûne şe'dêd Îsaye zor.
Qeydêd mirinê nikaribûn Îsa bigirtana. Ew ji nav mirîya r'abû û r'îya P'adşatîya E'zmana bona h'emû meriva vekir!
Dijmin gelek bûn, dîsa jî peyçûyêd Îsa çûne nav mileta.
Îsa Kur'ê Xwedê ye!
Mizgînî ne t'enê bi gotinê, lê bi nivîsara jî hate belakirinê.
Ewî gunêd me bedena Xweda r'akirine ser darmixê. Bona vê yekê em hindava gunada mirî ne. Ji vir şûnda em gerekê li gora xwestina Xwedê bijîn.
Îro peyçûyêd Mesîh her dera t'op dibin, dua dikin û K'itêba Pîroz dixûnin. Bona bîranîna mirina Mesîh ew nan kerdikin, dixwin û k'asa şeravê nav xweda bela dikin. Çimkî xwestina Xwedê ev e, ku h'izkirina Wî, ku dilê wanda dimîne, t'evî yêd mayîn bê p'arevekirinê.


Mesîh r'ê vekir, îdî meriv dikarin li gora nêt-meremê Xwedê bijîn.
Xudan me h'iz dike. Tu r'azîbûnê bide Wî.
Xwedê usa dinya h'iz kir, ku Kur'ê Xweyî tayê t'enê berva da, wekî her kesê ku Wî bawer bike unda nebe, lê jîyîna wîye h'eta-h'etayê hebe.
WILLEM DE VINK

Hê zêde bona Îsa:

Hêna Mesîhda çar şe'de hebûne. Her yekî alîyê xweda bona xizmetk'arîya Wî k'itêb nivîsîne: Mizgînîya Metta, Marqos, Lûqa û Yûh'enna. Evana bûne p'arêd K'itêba Pîroz – û ev serhatîya me jî ser bingehêd wan hatîye nivîsarê.


METTA yekî ji her donzdeh şagirtêd Îsa bû. Gava Îsa ji xercxana Kefernahûmê gazî wî kir, Metta her tişt hişt, t'evî wan çû. Hingê meriv e'cêbmayî man, ku Îsa bû hevalê xercgira. Lê Metta şe'dê van qewimandina bû û paşê bona van yeka xwexa nivîsî.

MARQOS hê xişîm bû, gava Îsa xizmetk'arîya Xwe kir. Marqos gelek cara t'evî Petrûs r'êwîtî kirîye û Petrûs ne'meke xweda wîr'a dibêje «lawê min». Peyr'a Marqos t'evî Pawlos jî r'êwîtî kirîye. Pawlos ew meriva bûye, yê ku Mizgînîya Mesîh nava miletêd mayînda jî bela kirîye.

LÛQA jî Mizgînîk nivîsî, lê ew wextê Îsada li wir nîbûye. Ew h'ekîmekî yûnanî bûye û paşê bawerîya xwe li Mesîh anîye. Ewî jî t'evî Pawlos r'êwîtî kirîye. Lûqa çûye cem gelek merivêd ku t'evî Îsa bûn, wekî tiştêd qewimî xwexa ji wan bibihê û binivîse. Usa jî ewî bona k'arêd şandîya nivîsîye û çawa civîna bawermendêd e'wlin nava necihûyada pêşda hatîye. Eva bû k'itêba bi navê «K'arêd Şandîya».


YÛH'ENNA cem Îsa ma, gava Ew hate xaçkirinê. Xilazîya Mizgînîya xweda Yûh'enna nivîsîye: «Îsa hê gelek nîşanêd din jî kirine, lê belê t'enê haqas hatine nivîsarê, wekî hûn bawer bikin, ku Îsa ye Mesîh, Kur'ê Xwedê, û bî vê bawerîya we, wê saya navê Wî jîyîna weye h'eta-h'etê hebe». Nava şagirtêd Îsada belkî Yûh'enna bû yê herî e'mirê dirêj. Ew e'mirê mezinaya xweda dîtinokêda dibîne, ku Îsa Kur'ê Xwedêyî r'ûmetkirî ye. Em vê yekê k'itêba E'yantîyêda dibînin, k'îderê bona axirîya dinyayê jî hatîye nivîsarê.

Lê tê çi bikî? Serhatîya Îsa Mesîh hela hê xilaz nebûye. Ew çawa qur'ne-qur'ne derbazî nisila bûye – usa jî dikare e'mirê teda dûmayî ke. Îsa dixwaze h'izkirina Xwe bide te û Bav Xwedêr'a teva bide naskirinê. Ewî berêda çawa kirîye, Ew îro jî usa dike. Heger bawer bikî, Ewê R'uh'ê Xweyî Pîroz bide te, wekî nav teda bijî û e'mirê te hindur'va biguhêze. Çi ku nav teda te'rî bûye wê bibe r'onayî. Bona ewê ku tirsa mirinêda dijî, niha bi saya navê Îsa hîvîya e'mirê h'eta-h'etayê cem Wî heye. Şikir Xwedêr'a, r'îya Mesîhda tu dikarî li gora xwestina Xwedê e'mirê xwe derbaz kî.




# Gelo çi ye? ...

Bawerkirin: Tu hîvîya xwe didî ser Xwedê, wekî çi ku Wî soz daye wê bîne sêrî. (r'ûp'ela 58)




Baxşandin: T'u meriv hêjayî vê yekê nîne, lê Xwedê dixwaze gunêd me bibaxşîne. Heger tu bi r'astî ber Xwedê bona gunêd xwe p'oşman bî û dixwazî e'mirê xwe biguhêzî, Xwedê wê gunêd te jî bibaxşîne. Ev baxşandin çêdibe, çimkî Mesîh cefa bona gunêd me k'işand. (r'. 58)




Bimbarekkirina Xwedê: tiştê baş ku Xwedê dide ewêd ku gur'a Wî dikin.

Cejina Derbazbûnê: Cihû tînine bîra xwe, ku ew çawa ji bindestîya Misirîya xilaz bûne. Bona bawermendêd Mesîh ew bûye Cejina R'abûna Îsa Mesîh, çimkî Ewî bona guneyêd merivayê e'mirê Xwe da. Lê r'abûna Wî k'ifş dike, ku Ewî gune û mirin alt' kirin. (r'. 38-54)



Duakirin: Tu dikarî bi dengê bilind yan jî bê deng t'evî Xwedê xeber dî – û guhdarîya wî bikî. (r'. 18,19, 42)

E'mirê h'eta-h'etayê: Xwestina Xwedê ev e, ku meriv pey mirina xwer'a bikaribin bê xilazî t'evî Wî û Îsa Mesîh bimînin. (r'. 23, 29-30, 59)



Gune: Tiştêd ku em dikin, miqabilî xwestina Xwedê ne. Ew nahêlin, wekî em bigihîjine nêt-meremêd Xwedêye bona me. (r'. 4)



Îsa: Navê Kur'ê Xwedê ye û tê fe'mkirinê: Xwedê xilaz dike.

K'itêba Pîroz (Bîblîya): Vê k'itêbêda tu dikarî bixûnî, Xwedê çawa li meriv dinihêr'e û Ew çawa t'evî wan mijûl e.



Kur'ê Xwedê: Navekî Mesîh e. Ew Xwedê ye û dinya pê Wî hatîye e'firandinê. Ew Xwexa hate dine, bû merivek, lê bê gune.

Mesîh: Naveke cihûyî ye, me'na wê: Yê R'ûnkirî (meşkirî) ye, bi welgerandina yûnanî bûye: «Xrîstos». (r'. 52, 55)

Milyak'et: Qasidê Xwedê - ne xuya ye. Xwedê naxwaze, ku meriv ber milyak'eta ta bin.

Nanê şkeva: Peyçûyêd Mesîh li hev dicivin û bona bîranîna mirina Mesîh û r'abûna Wîye ji mirîya nan kerdikin. (r'. 41)

P'adşatîya Xwedê: nava wan merivada ye, ku guhdarîya Xwedê dikin.

R'abûn: Îsa ji mirinê r'abû. R'oja axirîyêda wê h'emû meriv ji mirinê r'abin. Hingê Xwedê wê dîwana wan bike. (r'. 53-57)

R'uh'ê Pîroz: Ew R'uh'ê Xwedê ye û nava wan merivada dimîne, yêd ku li pey Îsa Mesîh diçin.

Şagirt: Peyçûyêd Mesîh (r'. 18)

Şeytan: Dijminê Xwedê û meriva ye. Hin jî wanr'a dibêjin îblîs û mîrêcin.

Veger'andina Mesîh: Heger Mesîh dîsa vediger'e dinê, her tiştî e'zmênda û ser e'rdê wê nû bê çêkirinê. (r'. 57)

Xaç: Darek bû, ku hêna R'omîyada bona kuştina merivêd mir'dar' didane sekinandinê. Îsa Mesîh bê gune bû, lê Ew dîsa hate xaçkirinê, çimkî Ewî e'mirê Xwe bona gunêd merivayê da. Bona vê yekê xaç bûye nîşana bawermendêd Wî. (r'. 25, 50)

*Ziman: K'urdî, zaravê Kurmancîya Kafkazê*
*language: Kurmanji Kurdish*
*ISBN:*

Eva t'erîqa r'ast e bona Îsa Mesîh û ser bingehê K'itêba Mizgînîyê nivîsî ye. Mesîh nêzîkî du h'ezar sal pêşda Îsraêlêda jîtîye. Her merivê ku Ew nas dikir e'cêbmayî dima. T'u kesî t'u car mîna Wî tiştek nikaribûye bike. T'u kes jî t'u car mîna Wî zane nîbûye. Mesîh diçû k'îderê li wir k'eremet dikirin. Ewî xêr û xweşî dida h'emûyêd ku gur'a Wî dikirin. Û nişkêva Ew dane kuştinê. Lê ev ne axirîya Wî bû. K'erema xwe bixûne çi qewimî û serhatîya Îsa Mesîh çawa bû.

Ziman: K'urdî, zaravê Kurmancîya Kafkazê (bi h'erfêd latînî)

